

## Girîngiya sembolên neteweyî di serdema torên civakî de

Ev çend sal in xelkê Rojhilatê Kurdistanê her sal cejna Newrozê bi rûmet û coşeke zêdetir pîroz dikin. Cejna Newrozê ne tenê di roja Newrozê de tê pîrozkirin, lê gelê Kurd gund bi gund, bajar bi bajar û herêm bi herêm mehek beriya Newrozê pîroz dikin û pêşwaziya sersala kevnar a Kurdî dikin ..........

Dom»R:4



*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (490)21-03-2025Buha (1000) Tûmen



## Newroza Xakîpoşan li Urmiyê daxuyaniya yekîtî û nasname ya neteweyî

Pêgeha cejna newrozê weke cejna herî kevnar ya welatê Kurdan, di çand û dîroka kurdan de taybet û xuya ye. Newroz, di rengeke cuda û bi rûmettir de ji cejnên kevneşopî yên din weke cejnên demsal û boneyên olî û çandî yên din, ji bo Kurdan yê bûye sergotar û sembola tevgera nasnameparêzî, berxwedan û hevgirtina neteweyî. Di dirêjahiya dîrok û hebûn de, Newroz her tim derfetek bûye ji bo ragihandina hevgirtin û vejandina nasnameya neteweyî........

Dom» R:6




## Hinek nêrîn li derbarê banga Ocelan

Ji şîdet û şerê ku zerarê dide gelê me re 'na', ji mafên kollektîf yên neteweyî, demokratîk û kulturî yên miletê Kurd re 'erê'!

Rojhilata Navîn di pêvajoyeke gelekî metirsîdar û hestiyar de derbas dibe. Di vê pêvajoya ne stabîl de, Kurdistan weke welat û kurd jî weke milet cihekî gelekî girîng digrin. Ev guherîn û bûyerên ku rû didin, dewletên dagirker yên Kurdistanê xistine nav tirs, tatolek û xofeke mezin û ji bo statukoya heye neyê guherandin çi ji destên wan tê texsîr nakin.

Dom» R:9

# Peyama Newrozî ya Komîteya Navendî ya Hizba Dêmokrat bi hilkefta destpêka sala nû ya xebat û tekoşînê



## Peyama rêzdar Mistefa Hicrî Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hilkefta cêşna Newroz a 1404 a Rojî

**Xwîşk û birayên rêzdar**

**Welatiyên Têkoşer!**

Bi hilkefta cêşna Newrozê, ez pirozbahiya germ li hemû netewên azadîxwaz ên Îranê bi taybet netewa Kurd, malbatên serbilind ên şehîdan û civaka hişyar û azadîxwaz a Kurdistanê dikim, li hember girtiyên siyasî û malbatên wan ên rêzdar bejna xwe ditewînin.

**Xelkê azadîxwazên Kurdistanê!**

Şirovekirina bûyerên sala derbasbûyî ji çend war û aliyan ve cihê balkêşandinê ne.

Sikest a projeyên siyasî û serbaziyên rêjîma Îslamî li navxwe û derveyî sînoran, yek ji wan aliyan e.

Dom » R:3

**Civaka Kurdistanê!**



Li destpêkê de bi hilkefta hatina Newrozê, cêşna netewî û dêrîn a Kurdan, pîrozbahiyê li we hemû çîn û qatên xelkê Kurdistanê dikin û hivîêdar in li sala nû ya jiyan û tekoşînê de jî, xebata siyasî û netewiya me û yekîtî û yêkrêziya xebatkaraneya me pêngawên zêdetir ber bi armancên vê hilbigrin.

Li devdevê Newrozê de silav li we xelkê Kurdistanê ku tevî hemû givaşên gelek zêde yên komara îslamî û tev qeyranên navxweyî, alaya xebata nasnamexwaziya netewiya Kurd li Îranê de bilind ragirtiye.

Silav li girtiyên siyasî ku bi serîneçemandin û xweragirî li girtîgehên komara îslamî, kirine çepera azadîxwazî û silav li malbatên wan dikin ku nirxeke giran a vê xebat û xweragiriyê, kevtiye ser milê wan.

Silavan li malbatên serbilind ên şehîdan û malbata pêşmergeyên cangorî yên niştiman dikin, silav li hemû birêveber û xebatkarên Kurd dikin ku li navxwe û derveyî welat, bi hewel û tekoşîna wan a berdewam e ku rûkek zindî û her dem rû bi geşekirinê dane tevgera siyasî û netewiya Kurd li Îranê de.

Dom » R:2



## Pêvajoya «Aştîyê» û bidavîanîna «terorê» di navbera PKK û dewleta turk de

Dom » R:5



## Pirsa Kurdî di navbera Şam û Hisiçe dedibînin?

Dom » R:8

# Peyama Newrozî ya Komîteya Navendî ya Hizba Dêmokrat bi hilkefta destpêka sala nû ya xebat û tekoşînê



**Civaka Kurdistanê!**

Li destpêkê de bi hilkefta hatina Newrozê, cêşna netewî û dêrîn a Kurdan, pîrozbahiyê li we hemû çîn û qatên xelkê Kurdistanê dikin û hivîêdar in li sala nû ya jiyan û tekoşînê de jî, xebata siyasî û netewiya me û yekîtî û yêkrêziya xebatkaraneya me pêngawên zêdetir ber bi armancên vê hilbigrin. Li devdevê Newrozê de silav li we xelkê Kurdistanê ku tevî hemû givaşên gelek zêde yên komara îslamî û tev qeyranên navxweyî, alaya xebata nasnamexwaziya netewiya Kurd li Îranê de bilind ragirtiye. Silav li girtiyên siyasî ku bi serîneçemandin û xweragirî li girtîgehên komara îslamî, kirine çepera azadîxwazî û silav li malbatên wan dikin ku nirxeke giran a vê xebat û xweragiriyê, kevtiye ser milê wan. Silavan li malbatên serbilind ên şehîdan û malbata pêşmergeyên cangorî yên niştiman dikin, silav li hemû birêveber û xebatkarên Kurd dikin ku li navxwe û derveyî welat, bi hewel û tekoşîna wan a berdewam e ku rûkek zindî û her dem rû bi geşekirinê dane tevgera siyasî û netewiya Kurd li Îranê de.

**Welatiyên xoşewîst!**

Ew resmek cîkevtî ya xelkê Kurdistanê ye ku ji mêjve ye felsefeya Newrozê wek hêmaya jiyan û serîhilkdanê kiriye çiraya rênîşanderê jiyan û xebat û bi tekoşîn û nekevtinê, bi hevgirtî û bi yekîtî li çepera nasnamexwaziya xwede bi qahîmî, sekinîne. Li wan rojane de jî û li berdewamî ya pêvajoya tevgera netewî û nasnamexwaziya civaka Kurdistanê de hilkeftên taybet bi pêşewazî li sala nû nya rojî û rêûresmên Newrozê, bûne meydaneke din a xebat û çalakiyên siyasî û medenî.

Li heyama sala derbasbûyî de û piştî rêûresma berfireh û tejî peyam û wateyên Newroza 1403 a rojî, xelkê Kurdistanê li hilkeft û derfetên curbicur de û bi afirankariyên xwe, tevî piştevanîkirin û parastina nirx û bihayên netewî yên xwe, wek hertim li hember reştirîn rêjîma serdem, anku komara îslamiya Îranê û siyasetên dijî geliyên wê li xebta û tekoşîna xwe, berdewam bûn, bo vê berdewambûn û xebat û xweragiriyê jî nirxeke zêde daye.

Xelkê Kurdistanê tevî dijwariyên jiyan û derbaskirina jiyasna rojaneya xwe ku bi sedema siyasetên çewt û tejî şaşiyên siyasî û aborî yên rêjîmê ve bi ser wan de sepiyaye, lipeyketin bi çarenivîsa siyasî û parastina keramеta miroviya xwe, piştgoh neavêtine û li her rewşekê de helwîsta bi wec a xwe hebûne. Li vê derheqê de rola civaka medenî û çalakiyên li warên cuda, wêjeyî, jîngeparêzî, mamostayan, kedkaran, parêzvanên ziman û kultûra Kurdî, mamostayên olî yên dilsoz bi ax û xelkê, jinan, ciwan û nûgihanan û …yên din, berçav û xwedî bandor bûye.

Komara îslamiya Îranê ku 46 sal e bi gitinepêşa hemû cure siyasetekeî tepeserkarane hewla dijayetî û jinavbirina hemû cur nirx û nîşaneyên netewî û nasnamexwazaneya xelkê Kurdistanê dide, li sala derbasbûy de jî û pêka karên xwe yê hertimî, tundtir û dijîtir jî reftar kiriye, ew jî li çendqatbûna kuştin, girtin, binçavkirin û bidarvekirinan li Kurdistanê bi berawird digel cihên din ên Îranê, bi ronî û bi tevavî, eşkere û xuya ye.

binçavkirina ciwanan bi hêceta lixwekirina kincên xakî ku hilgirê nirx û wateya taybet bi xwe ye û gefxwarinên vê dawiyê yên dezgehên ewlehî li ser çawatiya birêveçona rêûresmên Newrozê û tirsa wan ji hêma û wan kincên xelkê Kurdistanê li hilkeft û rêûresman de bi kar tînin, nûtirîn reftara dijîgelî ya komara îslamî li hember xelkê Kurdistanê ye. Li hember de xebat û tekoşîna xelkê Kurdistanê bi sedema bilindî û hişariya netewî, rêkxistîbûna civakî û dengvedana peyama nasnamexwaziya tevgera tejî şanazî ya siyasiya Kurd li dil û hundirê her kesekî civaka Kurdistanê de çarçoveyek berfireh û kûr, li xwe girtiye. Pirsên curbicur ên Kurdistanê ku ji niha ve pênaseyek giştî ya mafxwazî û nasnamexwaziyê li xwe girtiye, bi tevlîbûn û bi hevrebûna hêza xebat û xweragirî, tevgerek mezîn rê xistine ku li her derfetek ku tê pêş, bi qeware û peyama taybet xwe dîde nîşandan. Tevgerek ku li ser pêgeha rijde tevgera “Jin Jiyan Azadî”yê de ji sînorên Kurdistan û Îran û Rojhilata Navîn derbas bû û li asta navnetewî de bû mînak û karlêkeriya bi wec a xwe kir.

**Xelkê xebatkarê Kurdistanê!**

Niha ku em ber bi nûbûna sal û hilkefta Nerwoza 1404 a rojî ve diçin, careke din, we xelkê Kurdistanê li çarçoveya rêûresm û kombûnên girseyî de ku we bi “Newroza Xakîpoşan” navdêr kiriye, bi mifahvergirtin ji dirûşm, hêma û kincên taybet, qonaxeke din a hereketa nasnamexwaziya xwe derbas dikin û bê guhdan bi asteng çêkirina desthilatê, rû bi pêşveçon û nesekinî de ne. li qonaxeke wiha de ku xelkê Kurdistanê bi şêwaz û reftarên curbicur şirove û wateya zindîbûna xwe wek netewek û pirsa xwe ya rewa dike, desthilata xosepên a komara îslamiya îranê jî li rewşea herî perîşetî û bêhêziyiya xwe de ye. Ew rêjima tepeserker li navxweyê Îranê de xwdiyê kêmtirîn rewatiya siyasî ye û li warê îdeolojîkî ve jî rastî şikesta hizrî hatiye û li asta navnetewî de jî li asta herî bêhêzî û şikestê de ye. Ev rîjîma bi dîtingeha gelên Îranê, bilî heriffin û çonê, ti rêyeke din nîne û welatê Îranê jî bê dawîhatin bi temenê vê rêjîmê, ti cure pêşkevtinekê bi xwe ve nabîne.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi piştqahîmbûn bi hêz û îradeya xelkê Kurdistanê û bi piştevanîkirin li xebata nasnamexwazaneya gel ku her niha bi qeware û şêwazên curbicur berdewam e û pêşve diçe, wa hizir dike ku bihêzkirina tevgera nerizayetiyên li navxweyê welat û xebat bo komkirina hêza meydanî ya xelkê li navxweyê welat, dikare paşekêşiyê bi siyaseta tepeserkirina rêjîmê bide kirin û li dawiyê de heriffina vê rêjîmê li pey xwe bîne. Lewma li wir ve em rû bi hemû kesayetî û hêzên siyasî yên navxwe û derweyî welat dikin û careke din jî pêdegiriyê li ser hewcehiya hestiyar a yekîtiya li nav mala Kurd, yekgirtina gelên Îranê û hewcehiya bihevnêzîkbûna zêdetir a rêkxiravên medenî û hêz û aliyên siyasî dikin û bo bidesdtveanîna vê jî, Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê hertm wek berê, amadehiya xwe radigehîne û xwe bi erkdar dizane.

**Serbikeve tevgera mafxwazaneya gelên Îranê li dijî komara îslamiya Îranê**

**Newroz û hatina sersala nû pîroz be**

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Komîteya Navendî**

# Peyama rêzdar Mistefa Hicrî Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hilkefta cêşna Newroz a 1404 a Rojî

**Xelkê azadîxwazên Kurdistanê!**

Şirovekirina bûyerên sala derbasbûyî ji çend war û aliyan ve cihê balkêşandinê ne. Sikest a projeyên siyasî û serbaziyên rêjîma Îslamî li navxwe û derveyî sînoran, yek ji wan aliyan e. destpêka vê, bi şikesta şanoya binav hilbijartinên serkomarî, bi sedema dengê "NE" a piraniya xelkê ve bû. Piştre şikest û lawaziya hêzên milîsên ser bi rêjîmê li pey hat. Ew şikesta li berpaniya serbazî, zanyarî û meydanî de qewimî ku pêştir komara îslamiya Îranê, wek "kûrahiya stratejîk" a xwe binav kiribû. Ew pirsgirêkên nû ku li bestêna goherînên berfireh ên deverê de qewimîn, digel şikesta serbazî ya Hemas û Hizbullaha Lubnanê û bi taybet piştî herifîn a rêjîma Beşar Esed, walatiyeke serbazî, zanyarî û bi giştî kûrahiya arîşên navxweyî yên komara îslamî jî zêdetir hatine xuyakirin.

Li sala 1403 de ew qeyranane bi hejmarek qeyranên pengurî û îflasa aborî, siyasî, civakî, jîngeyî, wize û birêveberiyê, kûrtir bûn. Qeyran û gendeliya sîstematîk, beşeke ji kultûra desthilata komara îslamiya Îranê ye ku bi rêya tevlihevkirina hêza tepeserkirin, damezrawe, yasa û îdeolojiyê ve berhem tê. Komara îslamiya Îranê, li tevahiya xwe de pêdegirî li ser "rewşa heyî" dike, ew jî îşareyek bo rewşa daxistî ya rêjîmê û şikandina kirameta mirovan.

Îsal rêjeya bidarvekirinan bi berewird digel sala derbasbûyî, %17 zêde kiriye. Bi tenê li sala 2024 a Zayînî, zêdetir ji 900 kes hatine bidarvekirin ku 31 ji wan jin bûn. Zêdetir ji 140 çalakvanên jin hatine girtin. Biryara bidarvekirin a dehan kesan hate dan. Li Kurdistanê de jî 2 jin ên çalakvanên siyasî yên bi navên "Wirîûşe Muradî û Pexşan Ezîzî" sizaya bidarvekirinê bi ser wan de hatiye sepandin.

Li Kurdistanê de jî, îsal bidarvekirin û sepandina sizaya bidarvekirê, tepeserkirina jinan, kedkaran, xwendekaran, bi armancgirtina kolberan, girtin û binçavkirina jîngehparêzan, rojnaevan, mamostayan, çalakvanên medenî û çalakvanên warê ziman û dehan tawan û binpêkariyên din, dîmenên hertimî bûn.


Tevî rewşa tepeserkirinê, pêwajoyeke watedar li ser şeqam û cihên giştî, firedana hicaba bizorê ji aliyê jin û keçan ve ye. Jinên netirs û hişyar, zêdebarî siza û yasayên dijî mirovî, bi wan kiryaran, îdeolojiya desthilkata paşvero ya rêjîmê xistinê jêr pirsyarê û selimandine ku piştevanî li azadî û mafên xwe yên zewtkirî an destbiserdegirtî dikin. Bi giştî eniya dijberên rêjîmê û serweyî hemûyan jî, tevgera jinan, qonaxeke nû ji rikeberiyê, diceribînin.

Li xebata pitir ji 100 saleya netewa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, bi ronî tê dîtin ku hizra Kurdayetî û azadîxwazî, bûye nirxeke girîng a hizrî û siyasî. Niha li her gund û bajarekê de zêdetir ji berê, asta hişariya netewî, a xelkê bilind bûye. Encama bilindbûna asta hişyariya netewî, li ser şeqaên Kurdistanê û li qonaxa tvegera jînayê de zêdetir xwe da nîşandan. Çendalîbûna xebata li dijî sitema netewî li Kurdistanê, li çend waran de hatine xuya.

**Kurdistaniyên azadîxwaz!**

Tevî ku pêywendiyên li navebra navend û lidûrxistiyan, aliyek dagîrkeriyê heye û ew xwebinavendkirina li pêvajoyeke dîrokî de hatiye rêkxistin kirinê, lê bi berdewamî wek mijareke sirûştî û asayê hatiye nîşandan. Navendek ku li pêxema parastina nasyonalîzma tepeserker a li Îranê de, rijandina xwîna mirovan bi pîroz dizane. Ew nasyonalîzma bi zordarî, kultûr û zimanê farsî bi ser ne-farsan de sepandiye. Xwestiye li jêr navê kulrûra hevpar a Îranî ve, kultûra farsî wek kultûreke netewî bide sepandin.

Paşhatên avakirina dewleta Îranî(bi wateya serweriya yek pêkhateyê) bi dirêjahiya dîroka xwe, berhemanîna pêywendiya serdestiya ku tê de heye, çend netewîbûn û çendîn nasnameyiya cografiyaya Îrana serdem, hatiye înkarkirin. Lê ew pirsgirêkane piştî tevgera "Jîna"yê û serîjildana herêmên netewî, li berjewendiya bidûrragirtiyan, nehevseng bûye. Pirsgirêkên nû li Kurdistan û herêm din hatiye çêbûne, tevgera Jînayê digel vê manîfêstek bo azadiyê ye, hevdem bestênek bo bihevgihîştina dengên tepeserbûyan e. Hevxebatî digel netewên bindest ên li cografiyaya Îranê jî, hêz û wizeyek pengurî li hember hemû qurixkariyekê ye. Ev guherînên bê mînak û hêza xwedîbandor a paşeroja siyasî ya netewan û civakên li nav Îranê ye. Bi taybet Kurdistan zêdetir ji hemû caran, agehdarê tepeseriya regezî û aliyên sitema netewî bûye û dixwaze bi pêşengiya jinan, civaka Kurdî, vekheviyek zêdetir tê de bibîne.



**Xwîşk û birayên hêja!**

Bo mirovê azadîxwaz û netewa xwedî helwîst ku rewşa bêmafî û bêdesthilatiya xwe nas kiriye, derbasbûn ji rewşa bindestî, yekem bijarde ye. Bi têgihîştinek kûr li wan rastiyên ku rojane li ser axa xwe, dîrok, nasname, ziman, hêma û nirxên netewî ku li jêr gefa jinavçonê de ye û kevtiye ber gefxwarinan, take rê, xebat û berxwedan e. pêbendbûn bi wan pirensîpan, erkek dîrokî, siyasî û netewî ye. Xebata dijwar û bi xwîn li pêxema azadî û rêkxistinkirina tevgerek çendîn alî û berpan a netewî li dîroka serdem de ji aliyê Kurdistaniyan ve, ev erk bo berpirsayetî li hember ax û nasnamexwazî guherî ye.

Xaleke hevpar a serhildana "Jîna" û "Hilkefta Newrozê" anîneberçav a taybetmendiyên çendîn alî ya civaka Kurdistanê ye. Tevgera Jînayê, nirxên jiyaneke dûr ji tepeseriyan bo Kurdistanê dide ber çavan. Hizra Kurdinî zêdetir ji her demekê tevlî wateya rêzgarîxwazî û nirxên gotarî bûye. Newroz jî bûye hilkeftek ku tevî girêdana netewa Kurd bi dîrokek kevnar, wateya siyasî, gotara afirîner û rizgarîxwazane, jê berhem hatiye. Li vê wateya nû de Newroz, karnevalek a berxwedana netewî ye. Îşareyeke ron ku armanca wê, lêrabûn û rasan li dijî dagîrker û bêmafî ye.

Li tevgera Jînayê de civaka Rojhilatê Kurdistanê bi hemû çîn û qatên xwe ve, Ji xwendekaran ve bigre heta kedkaran û mamostayên olî, jin û keçên azadîxwaz ve heta wan kasibkarên ku bi heftiyan deriyê dukan û bazarên xwe dadixistin, li lîstikvanê werzişî ve bigre heta mamostayên xwendingehan, beşdar bûn. Bi vê şêwazê, xelkê Rojhilatê Kurdistanê da xuya ku remza hermana Kurdistanê li curbicurî û hevhelwîstiyê de ye, da xuya ku ku hemû deman li dijî her cure hizreke faşîstî ku bixwaze maf û kirametê tepeser bike, bisekine. Li Newroza îsal de jî wek nerîtek bi dijî sitem û dijî dagîrkerî, netewa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê de agir berda koşka tarîtiyê. Hêmaya Xakîpoşan û parêzerên xakê têkel bi kincên rengarengên Kurdistaniyan dibe. Bi yekdengiyê ve sirûda Ey reqîb disitrûnîn û Newrozê dikin bi hêvinê nûbûn, bihêzbûn û yekîtiya netewî li seranserê Kurtdistanê .

Civaka Rojhilatê Kurdistanê bi sedema siyasîbûna nasnamexwaziya Kurdî û ceribandina dûr û nêzîk li tevgera netewî û medenî, şiyana xwerêkxistinkirinê heye. Civakek pêşeng ku li meydanê de ye, xwe bi xwdiyê pirsa netewî û nasnameya xwe ya netewî dizane. Her li vê derheqê de wek Hizba Dêmokrat a Kurdiatana Îranê, em wa hizir dikin ku rewşa nû ya deverî û bêhêziya rêjîma îslamî li navxwe û derve, bestên û derfetek bo avakirina hevpeymaniya azadîxwazan û herêmên netewî yên gelên bindest li dijîê vê rêjîmê, afirandiye. Li derheq Rojhilatê Kurdistanê, tekezî li ser vekhevî û hevxebatî ya hemû hêz û aliyên siyasî yên Kurdistanê dikin. Wek Hizba Dêmokrat, bi şirovekirina rewş û defetan û gefên li ser rêya tevgera neteiya Kurdistanê, em berpirsayetiya xwe ya dîrokî tînin ber çavên xwe. Bi şirovekirina alî û kûrahiya guherînan, tevê xwerêkxistinkirinê, em tekeziyê li ser gotara Kurdistanî, vekheviya niştimanî û bihevgihîştina netewî, dikin.

**Bilind û pîroz be Newroza Kurdewarî**
**Mistefa Hicrî**
**Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Newroza 2725 a Kurdî**

# Girîngiya sembolên neteweyî di serdema torên civakî de



N. Dr. Mecîd Heqî

**Beşa 1**

Ev çend sal in xelkê Rojhilatê Kurdistanê her sal cejna Newrozê bi rûmet û coşeke zêdetir pîroz dikin. Cejna Newrozê ne tenê di roja Newrozê de tê pîrozkirin, lê gelê Kurd gund bi gund, bajar bi bajar û herêm bi herêm mehek beriya Newrozê pîroz dikin û pêşwaziya sersala kevnar a Kurdî dikin.

Heger Newroz ji bo neteweyên din tenê cejna sersalê ya kevin be, ji bo neteweya Kurd sembola berxwedan, vejîn û nûkirina têkoşîna hevpar a ji bo mafê çarenûsî û rizgariya neteweyî ye. Lewma cejna Newrozê li rojhilatê Kurdistanê her sal bi awayekî cuda û bi navekî cuda tê pîrozkirin û Newroz bûye derfetek ji bo nîşandana îradeya neteweya Kurd a azadîxwaz û şerê li dijî dagirkeriyê.

Sembolên neteweyî yên her neteweyekê, bi ala, sirûda neteweyî û cil û bergên kevneşopî, nasname, dîrok û îdealên wî miletî vedibêjin. Di nav gelê Kurd de ev sembol cihekî taybet digirin, hesta serxwebûnê, nasnameya kolektîf û berxwedana dîrokî ya li dijî dagirkerî û kolonyalîzmê temsîl dikin. Cejna Newrozê, weke yek ji pîrozbahiyên herî mezin ên gelê Kurdistanê, li derveyî bûyereke çandî yan jî cejneke asayî ye; Ev cejn sembola berxwedan, yekîtî û îradeyê ye ku di nava tevna dîroka gelê Kurdistanê de hatiye girêdan.

Lê di vê serdemê de, ku torên civakî û îstîxbarata çêkirî di ragihandin û danûstendinên gerdûnî de rolek diyarker dilîzin, girîngiya van sembolan hîn zêdetir diyar bûye. Ev gotar rola sembolên netewî di serdema dîjîtal de, bandora teknolojiyên nû li ser nasnameyên neteweyî û çandî û her wiha gefên hikûmetên dagîrker ji bo jinavbirina van sembolan vedikole.

**Newroz, Di cîhana dîjîtal de berxwedan û hevgirtinê pîroz dikin**

Cejna Newrozê di nav gelê Kurd de ne tenê cejneke kevneperest û kevnar e, di heman demê de derfetek ji bo îfadekirina nasnameya neteweyî û têkoşîna rizgariyê ye. Ev cejn her sal bi milyonan kes li çaraliyê cîhanê ji bo nûkirina peywendiyên xwe yên hevbeş bi hev re, weke parçeyekî bingehîn ê çand û kevneşopiya gelê Kurd dicivîne.

Cejna Newrozê ji bo gelê Kurdistanê ne tenê cejna destpêka biharê ye, belkî bîranîna têkoşîna dîrokî ya vî gelî ya ji bo azadî û mafê çarenûsê ye. Îro, medyaya civakî ji bo ronîkirina vê kevneşopiya dîrokî platformek berfireh peyda kiriye. Kurd li seranserê cîhanê bi rêya medyaya civakî dikarin wêne, vîdyo û peyamên xwe yên girêdayî Newrozê û nasnameya xwe ya netewî parve bikin û gotara xwe ya çandî pêş bixin.

**Torên civakî weke amûreke xurtkirina nasnameya neteweyî**

Torên civakî bi taybetmendiyên xwe yên taybet, hişt ku Kurd bi hêsanî û berfirehtir peyam, wêne û vîdyoyên girêdayî cejna Newrozê û nasnameya xwe ya çandî bi kesên din re parve bikin. Ji Twitter (X) û Facebook bigire heya Instagram û TikTok, medyaya civakî platformek peyda kiriye ku Kurd dikarin pîrozbahiyên xwe yên Newrozê bi zindî û cîhanî nîşan bidin. Haştagên girêdayî Newrozê yên wek #Newroz #Kurdistan bi lez di medyayê de belav dibin û dibin amûrek ji bo kişandina bala cîhanê li ser têkoşîna rizgarîxwaziya gelê Kurd.

Berê, pîrozbahiyên Newrozê bi giranî li cihên herêmî dihatin lidarxistin, lê bi hatina medyaya dîjîtal re, ev pîrozbahî cîhekî cîhanî girt. Gelê Kurd li çar aliyê cîhanê bi rêya platformên civakî dikarin Newrozê pîroz bikin û çanda xwe bi cîhanê bidin nasîn. Ev yek ne tenê dibe alîkar ku nasnameya neteweyî ya gelê kurd bi hêz bike, di heman demê de têkoşîna wî ya ji bo mafên xwe yên siyasî û neteweyî li qada navneteweyî berfirehtir dike.

**Hewldanên rejîmên desthilatdar ên ji bo rakirina sembolên netewî yên Kurdan**

Hem rejîma şahane û hem jî Komara Îslamî ya Îranê bi tepeserkirin, qedexekirin û bisînorkirina cejnên Kurdî, guhertina demografyaya Kurdistanê, guhertina navên Kurdan û pêkanîna jenosîda çandî, hewlên mezin ji bo jinavbirina kevneşopiyên Kurdî û bêparkirina gelê Kurd ji nasnameya neteweyî ya gelê Kurd dane. Piştî her cejna Newrozê di van salên borî de, rejîma Îranê dest bi girtina girseyên çalakvanên çandî û sivîl ên Kurd kiriye û bi cezayên girtîgehê û cezayên pereyan xelkê ditirsîne daku nasnameya xwe ya netewî ji dest nedin.




Ji bilî qedexeyên eşkere, sansûra zimanê kurdî di medyayê de amûreke din a tepeserkirina nasnameya kurdî ye. Medyaya dewletî di Komara Îslamî de bi awayekî sîstematîk rê li weşana nûçe û bernameyên ku bi zimanê Kurdî tên hilberandin, digire û tenê rê dide nûçe û bernameyên bi zimanê Kurdî ku xizmeta armancên bîrdozî yên rejîmê dikin. Ev meyl ne tenê dibe sedema lawazbûna zimanê kurdî, di heman demê de nasnameya çandî û siyasî ya gelê kurd jî dixe xeterê.

**Sembolên Neteweyî di Newrozê de û Bandora Medyaya Dîjîtal**

Ala Kurdistanê bi rengên xwe yên sor, kesk û zer, bi taveke geş di navendê de, her tim di pîrozbahiyên Newrozê de li ba dibe. Ev ala hêvî, wêrekî û daxwaza serxwebûnê temsîl dike. Sirûda netewî ya ku di civînên Newrozê de tê gotin, dengvedana têkoşîn û îdealên neteweya Kurd e. Cilûbergên neteweyî û herêmî yên gelê Kurd, bi rengên xwe yên cihêreng û nexşên xwe yên dîrokî, nîşana resentî û berdewamiya çandî ya vî gelî ye.

Di cîhana îroyîn de, torên civakî yên wekî Twitter, Facebook, Instagram û TikTok roleke girîng di danasîna sembolên neteweyî û nasnameya çandî de dilîzin. Hashtagên girêdayî Newroz û Kurdistanê bi lez û bez li ser medyaya civakî belav bûne û hişt ku çand û kelepûra kurdî li ser asta cîhanê were dîtin. Ji aliyek din ve, algorîtmayên îstîxbarata sûnî û analîza daneyê alîkariya baştir famkirina danûstendinên bikarhêner û zêdekirina hişmendiya pirsgirêkên neteweyî kirine.

**Rola sembolan di xurtkirina hevgirtina kurd de**

Sembolên netewî yên wek ala û sirûda netewî di cejna Newrozê de, ji bilî temsîlkirina nasnameya çandî ya Kurdan, alîkarîya xurtkirina hevgirtinê di navbera Kurdên cuda yên cîhanê de dikin. Di cîhana dîjîtal de ev sembol wek amûrek ji bo afirandina yekîtî û hevgirtinê di nav kurdên welatên cuda de tên bikaranîn û di heman demê de wek sembolên berxwedan û têkoşîna azadî û mafên mirovan tên naskirin.

**zîrekiya çêkirî û parastina nasnameya neteweyî**

Yek ji kêşeyên mezin ên cîhana nûjen bandora teknolojiyên nû li ser nasnameyên neteweyî ye. zîrekiya çêkirî dikare naveroka dîjîtal analîz bike û qalibên çandî nas bike. Ev teknolojî dikare ji bo parastin û pêşvebirina ziman û kevneşopiyên neteweyî jî were bikar anîn. Weke mînak, wergera makîneyê ya li ser bingeha AI-ê gihandina berfirehtir ji naveroka kurdî re dihêle û beşdarî pêşkeftina gotara çandî ya navneteweyî dibe.

Lêbelê, çawa ku AI dikare alîkariya parastina nasnameyên çandî bike, di hin rewşan de jî dikare wan bisînor bike û bisînor bike. Algorîtmayên medyaya civakî ji ber fîlterên agahdariyê dibe ku hin naverokên ku bi çand û nasnameya neteweyî ve girêdayî ne sînordar bikin. Ji ber vê yekê, pêdivî ye ku meriv hay ji van teknolojiyên çawa bixebite û wan bi hişmendî ji bo parastina sembolên neteweyî bikar bîne.

**Dom heye**

# Pêvajoya «Aştîyê» û bidavîanîna «terorê» di navbera PKK û dewleta turk de



N. Elî Munezemî




Peyama Ebdullah Ocalan a 25.02.2025an de hatî nivîsandin û piştre ji aliyê şanda DEM-partiyê ve hate xwendin û bilavkirin ku têde rêzdar Ocalan daxwaz li PKK ê dike dest ji çekan berde û xwe hilveşîne, li aliyê alîgirên wî ve bi destpêka pêvajoyek nû a bo aştiyê tê binavkirin, lê di heman demê de li aliyê karbidestên dewleta Turk ve bi pêvajoya nehêlana terorê tê zanîn.

Di wê kurtegotarê de armanc ewaye ku em bi pîvanên zanistên aştî û çareseriya nakokiyan wê peyamê şirove bikin.

Ligor dîtina Johan Galtun, nakokî ligel şîdetê cihê ye. Nakokî şîdet nine, lê dikare bibe şîdet jî, eger çend aliyan armancên nateba hebin.

Çareserkirina nakokî û kêşeyan pêvajoyeke vekirî ye ku tê de bi rêya bilêvkirina baş û zelalkirina têgeh û helwestan, bi awayekî afirîner ji nakokiyan derbas dibe, ji bo bidestxistina aştiya erênî. Yanî hevkarî ber bi armancên hevbeş ve.

Bo wê armancê, aliyên nakok ligel hev dikevin diyalogê (danûstandinê). Diyalog tevî nîqaşê cuda ye. Di diyalogê de herdu alî pirsan li hev dikin û nêrînên hev guharî dikin ku hew fambikin. Lê di nîqaşê de her aliyek cehd dike ku liser aliyê din de serkeve.

Li gor nêrîna Galtung, bo çareseriya nakokiyan, dibe çarçoweyek hevceye ku bikre kokê nakokiyê nas bike û bi avakirina zerfîyetê li ser asta herêmî, aşiyê biafirîne.

Di dîroka nakokiya navbera Kurdan li Bakûrê Kurdistanê û dewleta Turk de, xûyaye ku ew nakokî bi sedsalan e ku derbasî qonaxa tundûtîjiyê bûye û dewleta Turk li hember Kurdan li hemû awayên şîdetê, anku şîdeta rasterast, strûktûrell, kultûrî û xwezayî mifah wergirtiye.

Yanî dewletê bi çek û sîlahan êrişî kurdan kiriye û bi dehan cara komkujî pêk anîne. Sîstema desthilatdarî û birêveberiyê wisa çêkiriye ku kurd tenê semxatira kurdbûna xwe li îmkanat û başiyên jiyanê bêpar mane.

Ewan kultûrek şovînîstî û berçavteng afirandine ku di xizmeta tundûtûjên rasterast û strûktûrel de li hember kurdan tê bikar anîn û wan kiryarên hikûmetê rewa dike.

Herwisa ew ne tenê kurdan dikujin, tepeser dikin û neheqiyê pêre dikin, lê ew xwezaya Kurdistanê jî bi her awayekê têk didin û jiyana li ser xaka kurdan zehmet dikin.

Niha ku ew proseya binav aştîyê de - bi gotina Ebdullah Ocalan- û di nehêlana «terorê» de – bi gotina karbidestên turk- basa encamên diyaloga wan nîne.
Ew yeka nexuyaye ka ewan basa kîjan nakokiyan kiriye û rêka çareseriya wan nakokiyan çawa diyarîkirine.

Ebdullah Ocalan bi anîna berbasa şert û mercên damezirandina PKK û guhertina wan şert û mercan, wê akamê werdigre ku êdî hebûna PKK ne pêdivî ye û dibe sîlahan danê û xwe hilweşîne.

Ew herwisa mafê çarenûsê bo kurdan bi rewa nabîne û wê yekê bi paşveroyî dihesibîne û daxwaz dike kurd tewî pêvajoya demokrasiya li Turkiyeyê bibin. Lê Ebdullah Ocalan zelal nake ka gelo Turkiye li kengê ve bûye xwediyê sîstemek demokratîk ku haya kesê lê tune ye.

Li hêla din jî, dewleta turk li ser gefên xwe pêdagir û berdewam e. Bo wan armanc nehêlana «terorê» armanca sereke ye û ewê yekê jî li nemana PKK de dibînin.

Ew jî zelal nakin ku ew pêvajoya yê çawa here pêş û eger PKKê xwe hilweşand, yê çawa wan girîlayan carek din ji nû ve entegre (reintegration) bikin.

Ew herwisa xwe li basa çareseriya pirsgirêka kurd dibuhorin. Yanî çareseriya pirsa kurd ne xema Ebdullah Ocalan e û ne jî xema dewleta turk e.

Ew pêvajoya ştiyê yan nehêlana «terorê» di zanistên aştî û çareseriya nakokiyan de ku Johan Galtung, afirînerê wê ye, jêre dibêjin aştiya neyînî.

Ew yek tê wateya bêdengkirina şer; anku nehêlana şîdeta rasterast. Ew yek qonaxeke girîng e bo gihîştin bi aştiya erênî. Lê ew yek demekê mumkin dibe ku plan hebe.

Li nebûna plan bo wê yekê û li egera rastvegeriyana aştiya neyînî û nemana PKK de, hingê yê destê dewleta turk bo cîbecîkirina her sê awayên din yên şîdetê wekirîtir be û ew yek jî yê bibe sedem ku şoreşa kurdan bi sedan salan bizivire bo paşve.

Liber hindê, pêdivîye ku ew diyaloga navbera rêzdar Ocalan û dewleta turk li awayê xwe yê veşartî derkeve û bi awayek zelal û eşkere birêve here.

Hingê ew yek dikare nîgeraniya kurdan kêmtir bike û ew pêvajo bi piştevanî û dilxwaziya gel bihêztir pêşve here. Eger wisa nebe, ne ew pêvajo serkevtî dibe û ne jî tiştek dest kurdanve tê.

# Newroza Xakîpoşan li Urmiyê: daxuyaniya yekîtî û nasname ya neteweyî



N. Serbest Urmiye

Pêgeha cejna newrozê weke cejna herî kevnar ya welatê Kurdan, di çand û dîroka kurdan de taybet û xuya ye. Newroz, di rengeke cuda û bi rûmettir de ji cejnên kevneşopî yên din weke cejnên demsal û boneyên olî û çandî yên din, ji bo Kurdan yê bûye sergotar û sembola tevgera nasnameparêzî, berxwedan û hevgirtina neteweyî. Di dirêjahiya dîrok û hebûn de, Newroz her tim derfetek bûye ji bo ragihandina hevgirtin û vejandina nasnameya neteweyî, çandî û civakî ya kurdî di seranserî Kurdistan û cîhanê de.

Li bajarê Urmiyê ku bajarekî kevnar ê Kurdan e, ji ber ku ji ber hilkevta xwe ya erdnigarî û erdnigariya siyasî, bûye wareke pir reng ji netewe û çandên cuda, pîrozkirina Newrozê di rengeke cuda û balkeş de derdikeve. Bi xasmanî dema ku ev cejin bi têgehên weke şoreşa Çandî, pêkhatina nasname û yekîtiya neteweyî ve tê girêdan. Di vê gotarê de em dê pêgeha Newrozê di dîroka kurdan de, bi taybetî li Urmiyê û girseyîbûna Newroza Xakîpoşan, binirxînin û bandora wê li ser yekgirtin, nasname û xurtkirina bizava nasnamexwaziyê bînin ber bas.

**Newroz di dîrok û çanda Kurdan de:**

Newroz ji kevin ve di nav Kurdan de xwedî pêgeheke taybet bûye û cih girtiye. Weke sembola azadî, berxwedan û vejîna nasnameya netewî hatiye û tê naskirin. Ji serdemê kevin ve heta serdema nû ku serdemê nûjenbûnê ye, ev cejin bi terz û titalên xwe yên taybet di nava Kurdan de zindî maye û her sal pir rengtir dibe.

**Newroz li Urmiyê**

Urmiye wek yek ji bajarên girîng ên kurdan e ku him di warê neteweyî û çandî de û him jî di warê siyasî û jeopolîtîkê de, hertim bûye meydana parastin û nîşandana nasname û çanda kurdî. Tevî sînordarkirin û berteng kirina derfetên siyasî û civakî li ber Kurdan û her wiha hewildan ji bo bişavtina neteweyî hevdemî seranserî Kurdistanê, kurdên Urmiyê hertim ji cejna Newrozê wek derfetek ji bo daxuyaniya nasnameya xwe û nîşandana yekîtiya xwe ya neteweyî mêze kirine û pîroz dikin. Ev ceijn di heman demê de ku di rengê girêdana dîrokî a Kurdan bi ax û çanda xwe de derdikeve, di heman demê de jî dibe çepera pêşxistin û zindîkirina nirxên çandî û neteweyî yên gelê Kurd.

**Newroza Xakîpoşan, Sembola Nasname û Berxwedana neteweyî**

Newroza bi kincên xakî yek ji diyariya herî diyar a vê cejnê ye ku beşdarên wê bi lixwekirina cil û bergên Kurdî, hevdem tevî hebûna xwe ya neteweyî, nasnameya xwe ya çandî jî nîşan didin. Li gel pîrozkirina xwezayê, ev rêûresm li Urmiyê û tev herêmên Kurdistanê yên din dibe peyama hevgirtin, berxwedanê û pabendbûna bi nirxên neteweyî.

**Aliyên cûda di Newroza Xakîpoşan de li Urmiyê**

1. daxuyaniya nasnameya neteweyî û çandî: Ev rêûresm bi girseyîbûna xwe derfetek bû ji bo nîşandana nirx û çanda neteweyî weke beşdariya berfireh a gel, cil û bergên gelêrî, muzîka gelêrî û dîlanên herêmî yên ku rastiya Kurdan weke neteweya kevnar di vî bajarî de nîşan didin.

2. Xwepêşandana aştîxwazane: Newroza Xakîpûşan li hin xalên dîrokî û serdemî de weke xwepêşandaneke sembolîk ji bo selimanddina nasnameya neteweyî û bidestveanîna mafên neteweyî, çandî û selimandina nasnameya Kurdan hate lidarxistin.

3. Perwerdeya nifşa ciwan: Bi lidarxistina vê merasîmê hêlek ji bo nasîna nifşê ciwan bi nasnameya xwe ya neteweyî, dîrokî û çandî re peyda bû û beşdarbûna wan di cejna han de, hesta endambûnê di civaka Kurd di hebûna wan de xurtir kir.

**Newroz wek şoreşeke neteweyî û çandî di bihkirina nasname û Yekîtîya Netewî de**

Newroz ji bo kurdan ne tenê cejn e; Belkû, ew şoreşek e him di qada neteweyî û him jî di qada çandî de. Di dirêjahiya dîrokê de, di vejandina nasnameya neteweyî û hewldana bidestxistina mafên neteweyî, çandî û civakî de rolek bingehîn hebûye û heye.

**Cejna Newrozê çeperê xurtkirina nasnameya neteweyî**

1. Parastina ziman û çandê: Newroz platformek e ji bo pêşxistina zimanê kurdî, muzîka kevneşopî û wêjeya folklorî .




2. Bihêzkirina yekîtiya civakî: rêûresmên Newrozê derfeta hevgirtinê di navbera Kurdên ji herêmên cuda de tine holê. Weke nimûne pîstevaniya Kurdên herçar parçeyên Kurdistana parvekirî li Newroza Xakîpoşan li Rojhilatê Kurdistanê.

3. Berxwedana li hemberî siyasetên bişavtinê: Di dîrokê de gelek hêzên serdest hewil dane ku nasnameya Kurd tune bikib, lê Newroz her tim bûye faktora nûkirina vê nasnameyê.

**Pirsgirêk û derfetên Cejna Newrozê bo gelê Kurd li Urmiyê**

1.Pirsgirêk

1.1. Sînordarbûn ji hêla hikûmetê ve:

- Kontrol û rewşa awarte ya ewlehiyê li ser civînên Newrozê.
- Qedexekirina bikaranîna sembolên neteweyê yên Kurdî, weke ala, kincên gelêrî û muzîka folklorî.
- Hewldana guhertina naveroka neteweyî û çandî ya Newrozê û çavdêriya hikûmetê li ser.

2.1. Zextên civakî û siyasî

- siyasetên bişavtina neteweyî û çandî: siyasetênku hewil didin hêmayên neteweyî û çandî yên kurdan bilevtînin, ev yek dikare bandorê li pîrozkirina Newrozê bike.
- Nebûna piştevaniya fermî ji bo pîrozkirina Newrozê: Di deveran de ku hewil tê dan nasnameya Kurdan nemîne, Newroz weke hewceji aliyê saziyên hikûmetê ve nahê piştevanîkirin.

2.Derfet

1.2. Bikaranîna medyaya civakî ji bo belavkirina hişyariya neteweyî û nasnameya kurdî: Parvekirina wêne û vîdeoyên Newrozê û lidarxistina kampanyayên mediyayî û çandî ji bo danasîna Newrozê li qada navneteweyî de nirxên vê cejnê bandor li ser jordebirina asta hişiyariya nifşên ciwan heye.

2.2. Xurtkirina hevkariya neteweyî û çandî di navbera Kurdên de:

Rêkxistina merasîmên pîrozbahiyên Newrozê yên hevbeş li ser asta herêmî û neteweyî, û vexwendina hunermend û kesayetiyên çandî ji bo beşdarbûna van merasîman û herwiha lidarxistina civînên çandî li dor rola Newrozê di nasnameya kurdî de, dikare alîkariyeke berçav bide pirsa han .

3.2. nasandina Newrozê weke mîrata neteweyî û çandî ya Kurdan di saziyên navneteweyî de:

Radestkirina belgeyên dîrokî yên li dor girêdana Newrozê û nasnameya kurdî ji UNESCO'ê re.

**pîrozbahiyên Newrozê li welatên cuda ji bo balkişandina cîhanê**

mifah wergirtin ji rêxistinên navneteweyî ji bo nasandin, parastin û pêşdebirina Newrozê li cîhanê.

**encam**

Newroza Xakîpoşan a Urmiyê, zêdetir ji pîrozbahiyeke kevneşopî , bûye sembola şoreşa nasandin û xurtkirina nasname û çand û yekîtiya neteweyî. Derfetek bû ji bo parastin û ji nû ve afirandina nirxên neteweyî, çandî û zindî kirina kevneşopên Kurdî û nîşandana hevgirtina di navbera nifşên cuda de.

## Nerîna



**“Mistefa Hicirî”:**

**“Li xebata pitir ji 100 saleya netewa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, bi ronî tê dîtin ku hizra Kurdayetî û azadîxwazî, bûye nirxeke girîng a hizrî û siyasî”**



**“Nêçîrvan Barzanî”:**

**“Em bi hatina Newrozê hêviyan nû dikin û ji zehmetiyan derbaz bibin”**



**“Leyla Zana”:**

**„Ez dixwazim Kek Mesûd hemû rêxistinên Kurdan wekî zarok û birayên xwe bibîne„**



**“Mehmet Emîn Kardaş” :**

**“Em hêvîdar in ku NEWROZ ji hemû mirovahiyê bi sûd be”**

# Newroz li Kurdistanê: Cejna biharê yan sembola berxwedanê?



**N. Eskender Ceiferî**

Newroz, cejna kevnar a destpêka biharê, ji aliyê gelek neteweyên Rojhilata Navîn ve, ji Tacîk, Kurd, Afgan, Fars û Ozbek ve tê pîrozkirin.

Her yek ji van neteweyan Newrozê weke ya xwe dihesibîne û çîroka xwe vedibêje. Lê piraniya wan, ji xeynî kurdan, yek tişta hevpar ji bo Newrozê heye: destpêka biharê.

Newroz ji aliyê wan Neteweyan ve di 20 an 21’ê Adarê de tê pîrozkirin. Lê Kurd vê di roja 21’ê Adarê de pîroz dikin.

Tevî vê li Kurdistanê ev cejn ji bûyereke çandî û xwezayî zêdetir e. Wateya wê ya kûrtir û siyasî heye.

Newroz ji bo Kurdan ne tenê geşbûna xwezayê, lê sembola berxwedan, têkoşîna ji bo azadî û hevgirtinê ya li dijî hêzên dagirkarên Îran, Îraq, Tirkiye û Sûriyê ye.

Li Kurdistanê ev rêwresm demdirêj e ku di heftiyên dawî yên zivistanê de dest pê dike.

Di van heftiyan de Kurd li bajar û gundan kom dibin, dirûşmeyên azadiyê diqîrin û stranên şoreşgerî dibêjin.

Lê roja herî girîng a cejna Newrozê li Kurdistanê 21ê Adarê ye. Li gelek herêmên Kurdistanê ne tenê weke rêwresmeke tê dîtin, lê weke protêstoyeke li dijî zilma siyasî tê dîtin.

Rêjîmên Îran û Tirkiyê yên ku li “nasnameya kurd” mikur nayên, Newrozê weke metirsiyek ji bo ewlehiyê dibînin.

Li wir di çarçoveya pîrozbahiyan de çalakvanên Kurd her tim tên girtin. Lê dîsa jî, her sal bi milyonan Kurd dadikevin kolanan – ji Sine, Mehabad




û Urmiyê heya Amed û Wanê – Newrozê wek sembola berxwedanê bi şahiyên kolanan, dîlanên kevnar û pêxistina agir tê pîrozkirin.

Tevî ku Newroz li Îranê bi awayekî fermî wek cejneke netewî hatiye qebûlkirin, lê pîrozbahiyên li Kurdistanê bi tundî ji aliyê rayedarên ewlehiyê ve tên tepisandin.

Sedema ev e ku li herêmên din ên Îranê tenê wek cejn, lê li Kurdistanê wek berxwedan tê pîrozkirin.

Di pîrozbahiyên Newrozê yên Kurdistana de, hin beşdar carna wêneyên Dr. Ebdulrehman Qasimlo hildidin ku di 13’ê Tîrmeha 1989’an de li Viyanayê ji aliyê ajanên rêjîma Îranê ve hat şehîdkirin.

Çalakvanên Kurd dibêjin ku beriya cejnê ji aliyê dezgehên sîxuriyê ve tên gazîkirin û hişyarî li wan hatiye kirin ku beşdarî pîrozbahiyan nebin û kesên din jî han nedin.

Hin kes jî bi hincetên wekî “propagandaya li dijî sîstêmê”, “metirsiya ser ewlekariya netewî” an jî “şerê li dijî Xwedê” têne girtin.

Mînaka berçav a vê zordariyê, sepandina heşt sal û nîv girtinê bo ser Efşîn Husênpenahî çalakvanê Kurd li Sine bû.

Sedem handana xelkê ji bo beşdarbûna pîrozbahiyên Newrozê bû. Ev yek nîşan dide ku Îran çiqasî hestiyar e li hember her kiryareke sembolîk a girêdayî nasnameya Kurdî.

Carinan alozî çê dibin: Li bajarên wekî Sine, Mehabad, Merîwan û Bokanê, dema ku hêzên ewlehiyê êrîşî ser xelkê kirin, pevçûnên tund çê dibin.

Li Tirkiyeyê jî Newroz û kombûn û merasimên pîozkirinê ji aliyê desthilatdaran ve weke metirsî tê dîtin.

Li Rojavayê Kurdistanaê, Newroz bi dehan salan di bin desthilata rêjîma Esed de qedexe bû.

Ji hemû herêmên kurdî, tenê Başûrê Kurdistanê di lidarxistina pîrozbahiyên Newrozê de xwedî azadîyeke tewaw e.

Piştî ragihandina otonomiyê di sala 1991’ê de û piştî fêdêralîzmê di sala 2003’an de, Newroz bû yek ji girîngtirîn cejnên salê li Başûr.

Her sal bi hezaran kes li bajarên wekî Hewler, Silêmanî û bi taybetî li Akrê kom dibin û bi agirên di destên xwe de cejnê pîroz dikin.

Ev pîrozbahî ne tenê xwedî girîngiyên çandî ne, di heman demê de nîşana hevgirtinê bi Kurdên parçeyên din ên Kurdistanê re jî ne.

Gelek beşdar di dema hilkişîna çiyayan de li Akrê ji bo piştgirîkirina Kurdên Bakur, Rojhilat û Rojava, dirûşman hildidin.

Her sal bi milyonan Kurd li her çar perçeyên Kurdistanê dadikevin kolanan û bi agirê di destên xwe de ji cîhanê re dibêjin: Newroz ji bo Kurdan ji cejna biharê wêdetir e – sembola berxwedan, azadî û hêviya pêşerojeke baştir e.

# Pirsa Kurdî di navbera Şam û Hisiçe de



N. Ebdulezîz Qasim



Di çarçoveya hewldanên dibin ji aliyê Amerîka û Fransa û hindek dewletên dîtir wekî Almaniya ji bo dîtina hindek rêkarên pêwîst bo çareserkirina pirsgirêkên Sûriyê û di nav de dîtina çareseriyekê bo pirsa kurdî û her wiha ji bo beşdariya hêzên HSD di nav damudezgehên leşkerî yên Sûriyê de, di roja Duşemê 10'ê Adarê rêkeftinek di navbera serokê qonaxa veguhêz li Sûriyê Ehmed El-Şerih' û fermandarê Hêzên Sûriya Demokratîk Mezlûm Ebdî de hate îmzekirin.

Ev rêkeftin hat di demekî gelek hestyar de û ji nişkîve û bi awayekî bilez hat îmzekirin di demê ku komkujî li deverê Ewlewiyan li ser destê hindek hêzên leşkerî yên tundrew yên girêdayî Şamê dihatin pêkanîn, tevlî ku li gorî hindek çavkaniyan ku ev rêkeftin hat wekî encamek ji çend civîn û diyalogan di navbera HSD û berpirsên Şamê de.

Rêkeftin ji 8 xalan pêkhatiye ku xalên wê bi awayekî serekî leşkerî bûn, tevî garantîkirina mafên hemû Sûriyan ji bo beşdarbûna di pêvajoya siyasî û hemû saziyên dewletê de, bêyî cudahiyên olî û netewî, her wiha ku rêkeftin bi zelalî behsa Gelê Kurd nekiriye û bi tenê di xalekî behsa "Civaka Kurdî" hatiye kirin û "wekî civakeke resen di dewleta Sûriyê de" hatiye ziman, û têde hatiye ku "dewleta Sûriyê mafê wê yê welatîbûnê û hemû mafên wê yên destûrî garantî dike".

Li ser peyva "Civaka Kurdî", gelek karvedan û nerazîbûn di nav kolana kurdî de peyda bûn bi taybetî li ser ku kolana kurdî mikur tê li ser parastina nasnameya xwe ya neteweyî û dîrokî û xwe bi "Gelê Kurd" dide nasîn û her hewldaneke bi vî awayî red dike.

Her derbarê vê xalên rêkeftinê, ku heta niha jî gelek xal bi kurtayî hatine nivîsîn û her wiha bi zelalî nehatine diyarkirin yan jî şirovekirin, tevî ku rêkeftin behsa mafên destûrî yên kurdan dike, lê di beyannameya destûrî de ya ku piştî sê rojan ji vê rêkeftinê hate ragihandin, têde bi hîç awayî behsa Gelê kurd û mafên wî yên destûrî nehatiye kirin.

Li gorî pispor û zagonnas û şirovekarên siyasî û yasayî ku "Daxuyaniya destûrî" ji bo qonaxa veguhêz li Sûriyê, ya di 13ê Adarê de hatiye ragihandin, ku kopiyek ji destûra 1973 ya rêjîma Esed e û li ser bingeha "Zagona Daristanê" hatiye nivîsîn û têde behsa mafên pêkhateyên netewî û olî bi hîç awayî nehatiye kirin.

Ev beyannameya "destûrî" û tevlî komkujiyên li dijî Elewiyan. bû cihê nerazîbûnek navxweyî û navdewletî û bi taybetî ji aliyê tevgera kurdî û her wiha ji aliyê Durzî û Elewî û Kirstiyan ve bi xwepêşsndan û daxuyaniyan hate şermezar kirin.

Di demê ku gelek dewlet di nav de Amerîka, Frensa, Almaniya û Îsraîl tekeziyê li ser beşdariya hemû pêkhatiyên olî û neteweyî di Sûriya siberojê de dikin, berovajî van bangên navdewletî, wisa diyar dibe ku hikumeta Şamê ya nû hîç îradeyek nîne ji bo çareserkirina pirsgirêkên Sûriyê bi giştî û pirsa Kurdî bi taybetî, li hember van hewldanên perawêzxistina Gelê Kurd ji beşdariya di Sûriya nû de, hewldanên kurdî berdewam in ji bo yekrêziya Kurdî, li gorî nûçeyên vê dawiyê ku civînek giring di navbera ENKS û PYNK de li bajarê Hisiçe bi amadebûna Mezlûm Ebdî fermandarê HSD û bi çavdêriya Amerîkiyan di 18ê adarê de hate lidarxistin û têde rêkeftin bûye li ser şandeke hevbeş û bernameyeke siyasî neteweyî hevbeş li ser mafên Gelê Kurd di çarçoveyê dewletek nenavendiya Siyasî de, lê heta niha zanyariyên zêdetir û hûrgiliyên vê civînê ji kolana kurdî re nehatine ragihandin û li gorî hindek çavkaniyan dibe ku encamên Civîna Hisiçe pişta Cejna Newrozê di konfrenasekî rojnamevanî de dê bihête ragihandin.



# Hinek nêrîn li derbarê banga Ocelan



**N. Mustafa Ozçelîk**
**Serokê Giştî yê (PWK)**

Ji şîdet û şerê ku zerarê dide gelê me re 'na', ji mafên kollektîf yên neteweyî, demokratîk û kulturî yên miletê Kurd re 'erê'!

Rojhilata Navîn di pêvajoyeke gelekî metirsîdar û hestîyar de derbas dibe. Di vê pêvajoya ne stabîl de, Kurdistan weke welat û kurd jî weke milet cihekî gelekî girîng digrin. Ev guherîn û bûyerên ku rû didin, dewletên dagirker yên Kurdistanê xistine nav tirs, tatolek û xofeke mezin û ji bo statukoya heye neyê guherandin çi ji destên wan tê texsîr nakin.

Ev rewşa heyî dikare xeterî û metirsîyên mezin jî, lê herweha kês û firsendên dîrokî jî ji bo miletê kurd û kurdistanîyan bîne.

Di vê pêvajoya taybet û hestîyar de, bi însîyatîfa dewletê û bi "berdevkîya" Dewlet Bahçelî, rêberê PKKyê Abdûllah Ocalan, bêyî qeyd û şerd, banga çekdanîn û fesixkirinê li PKKyê kir. Banga Abdullah Ocalan, bi gelek alîyên xwe yên erênî û neyênî ve tesîreke mezin li ser raya giştî ya kurdên her çar perçeyên Kurdistanê, dîasporayê û gelên Tirkîyeyê dike. Lê belê, ji ber ku naverok û şêweyê bangê di nava xwe de gelek pirsgirêkan dihewîne, weha dîyar e ku gotûbêj û nirxandinên di vî warî de, dê berdewam bikin.

Em dawîlêanîna şerê çekdarî yê ku zerarê dide gelê me erênî dibînin,Ji ber ku banga Ocalanî, dawî li şerê çekdarî yê ku zerarê dide gelê me tîne, em weke Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK), banga Ocalanî ya ku dibêje "bila PKK çekan deyne" erênî dibînin.

Me weke Partîya Welatparêzên Kurdistanê, gelek caran dîyar kirîye ku li Bakurê Kurdistanê zemîna şerê çekdarî nemaye û çalakîyên çekdarî yên PKKyê zerarê didin doza gelê me.

Herweha aşkereye ku bi vê tesbîta Ocalanî ku dibêje "Netewedewletên cuda, federasyon, xweserîya îdarî û çareserîyên kulturalîst ku encama pêwîst a neteweperestîya tund in, nikarin ji sosyolojiya dîrokî re bibin bersiv." û bi sîyaseta ku dor û bera PKKyê bi salan e bi gotara ''Cimhûrîyeta Demokratîk, Welatê Hevbeş, Netewa Demokratîk'' dimeşîne, tu sebep tuneye ku şerê çekdarî bê meşandin.

Çalakîyên çekdarî yên PKKyê yên li Başûrê Kurdistanê jî, zerarê dide destkeftiyên federalî, dide gelê me û rê ji êrîş û dagrikerîya Dewleta Tirkîyeyê re xweş dikin.

Hebûn û kiryarên PKKyê yên li Rojavayê Kurdistanê, rê ji êrîş û dagirkerîya Dewleta Tirkîeyê ya li ser Rojavayê Kurdistanê xweş dike, zerar û ziyanek mezin û piralî dighînê xelkê me yê Rojavayê Kurdistanê. Ji ber vê rastîyê jî rawestandina şer û çekdanîna PKKyê, dê di berjewendîya gelê me de be.


Lê, her çiqas heta nuha di vê derbarê de Dewleta Tirkîyeyê tu daxuyanîyên erênî nedabin jî divê Dewleta Tirkîyeyê jî dawî li hemû operasyonên xwe yên leşkerî yên li Bakur, Başûr û Rojavayê Kurdistanê bîne.

Dawîlêanîna operasyonên leşkerî û van çalakîyên çekdarî yên ku zerarê dide gelê me, ji bo bidestxistina mafên neteweyî, demokratîk ên miletê Kurd dê rê ji amûr, rêbaz, xebat û têkoşînên sivîl, demokratîk û sîyasî re veke. Lê aşkereye ku bidawîanîna şerê çekdarî nayê wê maneyê ku dê milet Kurd dawî li xebat û têkoşîna xwe ya ji bo azadiyê û ji bo bidestxistina mafên milî û demokratîk bîne. Berevajîyê wê têkoşîna me ya milî û demokratîk dê bi amûr, rê, rêbaz, xebatên sîyasî, sivîl û demokratîk her berdewam bike. Têkoşîna bi amûr, rêbaz û xebatên sîyasî, sivîl û demokratîk, dê destên kurdên her çar perçeyên Kurdistanê jî xurtir bike. Her weha ev dê hem di berjewendîya gelê Kurd, hem jî gelê Tirk de be.

Partîya me, li gorî şerdan, her cûre rê û rêbazên meşrû yên têkoşînê ji xwe re esas digre û tevgerandina li gorî berjewendîyên neteweyî, weke berpirsiyarîyeke neteweyî û dîrokî dizane.

Bûgûman, çekdanîn û xwefesixkirina PKKyê ya li Bakur û Başûrê Kurdistanê û rewşa Rojavayê Kurdistanê divê weke du mijarên cuda bêne nirxandin. Bi statuyeke milî, cografî, sîyasî xweîdarekirina gelê me yê Rojavayê Kurdistanê mafekî rewa ye. Divê ev maf û hemû mafên kollektîf yên neteweyî, demokratîk yên miletê Kurd, di Qanûna Bingehîn ya Sûrîyeyê de bêne misogerkirin. Mijara pêşeroja hêzên çekdar yên Rojavayê Kurdistanê jî divê li gorî bicîhanîna van mafên meşrû yên gelê me bê zelal kirin. Bêyî statuyeke sîyasî, bêyî bidestxistina mafên kollektîf yên siyasî, neteweyî û demokratîk yên miletê Kurd; bêyî hukûmeteke hevbeş ya ku bi hemû pêkahateyên Sûryeyê hatibe avakirin; bêyî ku aramî û ewlehîya civakî hatibe misogerkirin, danîna çekên hêzên kurdên Rojavayê Kurdistanê dê rê ji êrîş, qetlîam û dagirkerîyên nû re veke. Divê kurdên her çar perçeyên Kurdistanê û dîasporayê li hemberî rîsk û planeke weha hişyar bin.

Netewedewleteke cuda, federasyon, otonomî û mafên kulturî, mafên herî rewa yên miletê Kurd û kurdistanîyan in,Me weke Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK), nerîn û helwestên xwe yên di derbarê birêvebirina "pêvajoya" di nava dewletê û rêberê PKKê Abdulah Ocalanî û di derbarê banga Ocalanî de, bi rêya sosyal medyayê û telewîzyonan bi raya giştî re parve kirîye û em dê di rojên peş de li ser vê mijarê nirxandinên berfirehtir bikin. Lê em nuha dixwazin bi taybetî balê bikşînin ser xalek girîng ku Ocalanî di banga xwe de anîye zimên. Ocalan di banga xwe de dibêje: "Netewedewletên cuda, federasyon, xweserîya îdarî û çareserîyên kulturalîst ku encama pêwîst a neteweperestîya tund in, nikarin ji sosyolojiya dîrokî re bibin bersiv."



Em bi awakî eşkere diyar dikin ku li gorî şert û mercan, "netewedewleteke cuda, federasyon, otonomî û mafên kulturî" mafên herî rewa yên miletê Kurd û kurdistanîyan in. Banga Ocalanî helbete ku wî girê dide. Lê, mafê tu partîyekê ya jî rêberê partîyekê tuneye ku li ser mafên bingehîn yên miletê Kurd biryarê bide û pêşeroja wî di binê ipotekê xîne. Em nerîn û helwestek weha rast nabînîn. Weke her miletekî li cîhanê, mafê miletê Kurd jî heye ku li welatê xwe bi statuyeke milî, cografî û sîyasî xwe îdare bike; li mafên kollektîf ên ji bo ziman û kultura xwedî derkevin.

Tecrubeyên dîrokî, pêvajoya ku em tê de derbas dibin, statuya federe ya ku li Başûrê Kurdistanê heyî, rewşa fiîlî û daxwaza statuya sîyasî ya li Rojavayê Kurdistanê, nimûneyên weke vana yên li cîhanê, di eslê xwe de, ne Ocalanî, lê têkoşîna meşrû ya milî, demokratîk û kulturî ya miletê Kurd piştrast dikin.

Îro, li gorî mistewaya ku miletê Kurd gihîştîyê û li gorî konjonktura nevneteweyî, heta ku mafên xwe yên milî û demokratîk û statuyeke sîyasî bidest nexe, dê miletê Kurd razî nebe. Ew mafê ku ji bo hemû miletên cîhanê heq be, lê ji bo miletê Kurd wek 'qebhet' bê dîtin; li dijî rastîya dîrokê ye.

Herweha em ne di wê qenaetê de ne ku gelê me û potansîyela welatperwer ya ku piştgirîya PKK û DEM Partîyê dikin jî li gel van fikrên Ocalanî bin. Ocalan ne bes mafê statuyeke milî, cografî, sîyasî; herweha ew, mafên kulturî yên miletê Kurd jî red dike. Ev jî bi tena serê xwe trajedîyeke mezin e.

Pirsa Kurd û Kurdistanê pirsa milet û welatekî ye û êdî bûye pirsek Rojhilata Navîn û navneteweyî. Pirsa Kurd û Kurdistanê, pirsa mafê çarenûsîya miletê Kurd e, pirsa mafê statuyeke milî, coğrafî, sîyasî ya li Kurdistanê ye. Ji bo kurdên li bajarên metropolên Tirkîyeyê dijîn, pirsa mafên ziman, kultur û demokratîk in; li cîhên ku kurd wek nifûs lê zêde ne, pirsa mafê îdareyên herêmî ne. Mixabin siyaseta Dewleta Tirkîyeyê ya heta îro ku li ser bingehê îmha, înkar û asîmîlasyonê meşandîye, her rê li ber çareserîya vê pirsgirêkê girtîye.

Li ser daxwazên acîl yên kurdan, divê Temsîlîyeta Kurdî bê ava kirin,Îro, ji bo rê li ber çareserîya vê pirsa dîrokî, neteweyî, niştimanî û mirovî bê vekirin, divê di guhertinên qismî yên Qanûna Bingehîn ya Tirkîyeyê de, weke daxwazên acîl, hebûna miletê Kurd û nasnameya wî, li gel zimanê tirkî mefê fêrmîbûna zimanê kurdî û perwerdeya bi zimanê kurdî, azadîya ramanî û rêxistinî bêne bicihkirin û misogerkirin. Divê hemû kesên ku ji ber fikir û xebatên xwe yên sîyasî, sivîl, demokratîk di hefsê de ne bêne azad kirin, divê hemû dozên bi vî rengî ji holê rabin.

Em dibêjin, nabe ku bicîhanîna van mafên bingehîn yên miletê Kurd, bi şerrawestandinê û bi çekdanîna PKKyê ve bêne girêdan. Pirsa kurd û Kurdistanê pirsek neteweyî û dîrokî ye; ne bi PKKyê hatiye holê û ne jî bi çekdanîn û fesixkirina wê ji holê radibe!

Helbet ku di pirsa çekdanînê de dê mixatab PKK be. Lê belê, ji bo çareserîya pirsa kurd û Kurdistanê, nabe ku ev mesele tenê di navbera Dewleta Tirkîyê û Ocalan, PKK, DEM Partîyê de, bi awayekî veşartî, di çerçoweyeke teng û neşefaf de bê gotûbêjkirin. Divê hemû partîyên sîyasî yên kurdan, dezgehên sivîl yên li Kurdistanê û rûsipîyên civakî yên kurdan li ser daxwazên acîl yên kurdan "Temsîlîyeta Kurdî" ava bikin û ev Temsîlîyeta Kurdî bibe mixatabê Dewleta Tirkîyeyê.

Em weke PWK, di wê bawerîyê de ne ku heta pirsa kurd û Kurdistanê di çarçoweya mafê çarenûsiyê de neyê nirxandin û li ser vî esasî neyê çareser kirin; ne li Tirkîye, Îran, Iraq û Surîyeyê û ne jî li Rojhilata Navîn, li Rojhilata Nêzîk, aştî û aramî dê pêk neyê.

Em bangî Dewleta Tirkîyeyê jî bangî Ocalan, PKK, DEM Partîyê jî dikin ku dev ji vê şêwe û rêbazên şaş berdin; ji bo çareserîyeke rasteqîn, divê herdu alî jî avakirin û mixatabgirtina Temsîlîyeta Kurdî qebûl bikin û ev temsîlyeta hevbeş mixetab bê girtin.Em bangî gelê xwe dikin ku piştgirîya şerrawestandin û çekdanînê bikin, lê li dijî inkarkirina mafên neteweyî, demokratîk û kulturî yên kolektîf rawestin û li mafên xwe yên neteweyî, demokratîk û kulturî yên kolektîf xwedî derkevin!

# Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li derheq lihevkirina HSD û dewleta Sûriyê de daxûyaniyek bealav kir

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê daxuyaniyek li derheq lihevkirina li navbera fermandeyê Giştî yê HSD “Mezlûm Ebdî” û Serkomarê demkiye Sûriyê, “Ehmed El-Şer`i” belav kir.**

**Deqa daxuyaniyl wiha ye:**

Roja Duşemî 20ê Reşemeya 1403 a Rojî, lihevkirinek li 8 xalan de li navbera “Mezlûm Ebdî”, Fermandeyê Giştî yên Hêzên Sûriya Dêmokrat (HSD) û “Ehmed Şer`i”, Serkomarê demkî, wajo kir ku hekî bi tevavî bê cêbicîkirin, beşek ji daxwaziyên gelê Kurd li Sûriyê, dê bidestve bên.

Bê guman li vê qonaxê de gelên Sûriyê piştî nemana rêjîma Beşar Esed û kurtkirina destê komara îslamiya Îranê li alozkirina welatên wan, zêdetir ji her demekê, hewcehî bi asayiş û aramî û pevrekarkirina li pêxema avedankirina welatê xwe hene.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, hivêdar e ku gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê de piştî dehan sal xebat û tekoşîn bo dabînkirina mafên xwe, bi mafên xwe yên yasayî û fermî, şad bibe.

Em hivî dikin ku ev rêkevtina destpêkek be bo garantîkirina mafên hemû pêkhateyên Sûriyê li yasaya bingehîn ya paşroja Sûriyê li avedankirina bi hevre û pêşxistina welatên wan de hevkar û alîkarderê hev bin.



**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Desteya Kargêrî**
**22ê Reşemeya 1403 a Rojî**
**12ê Adara 2025 a Zayînî**

# Zimanê zikmakî ber bi dil ve dibe



**N. Vênûs Fayêq**
**W. Hesen Mukerem**

Dema em derdikevin derve em dizanin ku zimanê me yê dayikê çiqasî xweş e. * Bernard Shaw *

Li Antwerpena Belçîkayê di festîvaleke helbestê de, ku min helbest bi hollandî û îngilîzî û paşê jî bi kurdî xwend, waliyê Antwerpenê ku amade bû, rabû ser piyan û çepikan lê xistin.

Gotina Nelson Mandela hat bîra min: “Heke hûn bi yekî re bi zimanekî ku jê têdigihê bipeyivin, ew dikeve hişê wî, lê dema ku hûn bi wî re bi zimanê dayikê diaxivin, ew di dilê wî de ye.

Dezgeheke me ya niştimanî nîne ku xizmet û pêşxistina zimanê kurdî yê yekgirtî bike, lê bi dehan helbestvanên me hene ku ji bo jiyankirin û parastina çand û nasnameya neteweya me têkoşîneke diyarker dane.

Di nav van de Ehmedî Xanî, Mela Cezîrî, Nalî û Selîm, Hacî Qadir Koyî û Mistefa Begê Kurdî jî hene, ku ji xeynî xweşkirina wêneya helbestî, peyvên erebî bikar anîne.

Hemn û Hazhar helbestên xwe bi zaravayê Mukriyanî û Şêrko Bêkas jî bi zimanekî rewan nivîsandine. Helbesta van helbestvanan dibistaneke fêrbûna zimanekî herikbar û xurt e.

Me hemû hewldanên xwe li ser dijberiya dagirkeran kiriye û ji bo parastina zimanên xwe di nava xwe de tiştek nekiriye Û ji herêmekê heta herêmeke din zimanekî me yê yekgirtî nîne ku bêyî wergêr me bigihîne hev û ji hev fêm bike,Divê em ji hesta kêmbûna li hember dagirker xilas bibin, fêm bikin ku tiştek me heye ku ew dixwaze me dagir bike û hewl bide ku jiyana me xirab bike.

Divê em zarokên xwe bi baweriyeke bilind fêrî zimanê dayikê bikin. Ji ber ku nifşek heye ku zanîna zimanekî biyanî û axaftina bi kurdîyeke şikestî tiştekî bêhempa û bêmînak dihesibîne. Ev zimanê ku dagirker dixwaze miletekî di nava miletê xwe de bihelîne bi kar tîne.

Ji bo pêşîgirtina li vê stratejiyê, ne hewce ye ku em çek hilgirin û şer bikin, lê divê em ziman ji nakokiyên partiyan bişkînin û ciwanan fêrî zimanê xwe yê dayikê bikin û biaxvin û bi zimanê xwe serbilind bin.

Nifşên me nikarin ji ya me bêtir bi dîroka miletê ku zimanê wî dixwînin nas bikin û bêtir helbestên biyanî bixwînin û bêtir li stranên biyanî guhdarî bikin. Çareserî ne qedexekirina zimanê biyanî ye, bi stratejiyeke neteweyî ya berfireh di mejiyê mirovan de hezkirina ji bo zimanê zikmakî bi cih kirin e.

Bi rastî, bi gelek zimanên biyanî axaftin û nivîsandina yekane ye, lê bi zimanê dayikê xwendin û nivîsandina xwe rûmet e. Ji ber ku tu miletekî din bi fêrbûna zimanê me şanaz nabe, ji ber ku ew jêhatî ye, ne serbilindî ye. Di dawiyê de, em dikarin bi her zimanî ku em dizanin wê bi peyvan vebêjin, lê di zimanê dayikê de giyanek bi peyvan têkel heye.



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjîma Îranê 4 girtiyên dinê bidar vekirin



Li halekê de ku ji destpêka heyva Reşemê ve rêjîma Îranê zêdetir ji 101 kesî li girtîgehên xwe li seranserê Îranê de bidar vekirine, roja derbasbûyî jî li girtîgehên rêjîmê li bajarên "Xuremabad, Zencan û Yezd"ê de 4 girtiyên din hatine bidarvekirin.

Pêka raporên belavbûyî, roja 19ê Reşemê, girtiyek ê temen 30 salî yê bi navê "Ehmed Seîdî" xelkê bajarê Zencanê, ku 2 sal berî niha bi tohmetên pêwendîdar bi madên hişber hatibû girtin û sizaya bidarvekirinê bi ser de hatibû sepandin, li girtîgeha rêjîmê li bajarê Zencanê de hate bidarvekirin.

Herwisa li 18ê Reşemê de jî, "Hûşeng Mihemedxanî", temen 31 salî, xelkê bajarê Yezdê ku 2 sal berî niha bi tohmetên pêwendîdar bi madên hişber hatibû girtin û sizaya bidarvekirinê bi ser de hatibû sepandin, bi nihênî û bê agehdarbûna malbata wî û hevdîtina dawî digel wan, li girtîgeha rêjîmê li bajarê Yezdê de hate bidarvekirin.

Herwisa li vê rojê de "Obeyd Melekî" yê temen 27 salî xelkê bajarê Dizfûlê û "Mihemedcewad(Efşîn) Hesenwend" ê xelkê Eleşterê, li girtîgeha rêjîmê li bajarê Xurem-abadê de hate bidarvekirin.

## 30 saziyên mafê mirovî daxwaza dawîhatin bi cudatîdanînên li dijî jinan kirin





30 saziyên navnetewî yên mafê mirovî, bi hilkefta 8ê Mars, roja cîhanî a "Jin", bi belavkirina daxuyaniyekê daxwaza bi fermînaskirina deng û mafên jinan û kêmîneyên zayendî" yên li girtîgehên Îranê de kirin.

Roja Înê 17ê Reşemeya 1403 a Rojî, 30 saziyên navnetewî yên mafê mirovê ku hejmarek ji saziyên mafê mirovî yên Îranê jî di nav wan de têne dîtin, bi hilkefta 8ê Mars, roja cîhnî a "Jin", bi belavkirina daxuyaniyekê daxwaza bi fermînaskirina "deng û ezmûnên jinan û kêmîneyên zayendî" yên li girtîûgehên Îranê de kirin.

Wan saziyên Mafê mirovî bi belavkirina vê daxuyaniya hevpar ragihandin ku "Jin û kesên ku zayenda cuda hene ku li rêjîmên hiqûqî yên regezperestane de, û di nava çîn û qata mêrsa-lar de li seranserê cîhanê, hatine binçavkirin, dibe li navenda berçavgirtinê de bin.

Hewrwisa li vê daxuyaniyê de tevî îşarekirin bi êrîşên bo ser mafê jinan û kêmîneyên zay-endî, amaje bi sepandina sizaya bidarvekirinê bi şêwazeke nedadperwerane ji aliyê rêjîma Îranê bi ser jinan dike û daxwaza rawestandin û hilweşandina wan sizayane dikin.

## Binçavkirina welatiyên Kurd ji aliyê rêjîmê ve berdewame



Li berdewamiya binçavkirina xoseraneya welatiyên Kurd ji aliyê rêjîma Îranê, vê carê jî , "Arizû Celîlzade" mamostaya bajarê Serdeştê, li 13ê Reşemeya 1403 a Rojî, li êrîşa xosearne û bê belgeya yasayî ya hêzên hov ên îtilaata rêjîmê li bajarê Serdeştê de bi ser mala wê welatiya Kurd, bi, hate binçavkirin û bo ciheke nexuya hatiye veguhastin.

Êwara roja Şemî 18ê Reşemeya 1403 a Rojî, hêzên îtilaata rêjîmê li bajarê Pîranşarê, bi awayekî xoserane û bê belgeya yasayî, êrîş kirine ser mala ciwanekî temen 24 salî yê xelkê bajarê Pîranşarê yê bi navê "Fexredîn Tahirî", kurê "Seyîd Muslih" û bi reftareke tundûtûj û hovane, ew ciwanê Kurd girtin û bo ciheke nexuya veguhastin.

Welatiyekî xelkê bajarê Bokanê yê bi navê "Bêhrûz Ferheng" li roja Sêşemî 14ê Reşemeya 1403 a Rojî, ji aliyê hêzên îtilaata rêjîmê li bajarê Bokanê, hatiye girtin û bo lêpirsînan bo girtîgeheke ewlehî ya rêjîmê li bajarê Urmiyê hatiye veguhastin.

Ebdullah (Rêbaz) Ehmedzade, çalakvanê çandî yê temen 45 salî yê xelkê taxa Hemalawa" ya bajarê Seqêzê ku endamê Encumena Çandî ya Helebçê" ye, ji aliyê hêzên îtilaata rêjîmê li wî bajarî, hate girtin û mala wî jî hate vekolîn û navbirî bo ciheke nexuya, hate veguhastin.

"Rehman Ehmedî" ê xelkê bajarê Banê, piştî gazîkirin bo dadgeha rêjîmê li bajarê Banê, hate girtin û bo girtîgeha inqilab a rêjîmê li bajarê Banê, hate veguhastin.

# Agirî

Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (490)

